



Belavoka kursa întegrasyonê

ji bo

- penaberên xwedan izina rûniştina demikî ji bo pêvajoya doza penaberiye (Aufenthaltsgestattung) li gorî mada § 55 bendê 1 ji yasaya penaberiye (AsylG),
- bîyaniyên xwedan izina rûniştina demikî (Duldung) li gorî mada § 60 bendê 2 hevoka 3 ji yasaya rûniştinê (AufenthG) û
- bîyaniyên xwedan izina rûniştinê li gorî mada § 25 bendê 5 ji yasaya rûniştinê (AufenthG)

Birêzan,

Hun dikarin ji bo erêkirina beşdarbûna xwe di kursa întegrasyonê de daxwaznameyeke nivîskî pêşkêşî dezgeha federal ji bo karûbarê koçberiyê û penaberan (Bundesamt für Migration und Flüchtlinge (BAMF) bikin. Taku daxwaza we were erêkirin, divê hun yekî ji van mercên jêrîn pêk bînin:

- Hun penaber in û xwedan izina rûniştina demikî ne (Aufenthaltsgestattung) û hemwelatiyê yekî ji van welatên jêrîn in :
 - Îran
 - Îraq
 - Sûriya
 - Erîtrea
 - Somaliya

Wek din jî çênabe ku we li welatekî din yê endamê Yekîtiya Ewropayê doza penaberiye kiribe û herweha çênabe ku hun li gorî rêbaza -Dublînê III hatibin mecbûrkirin, ku hun li welatekî din yê Yekîtiya Ewropayê doza penaberiya xwe bikin.

yan

- Hun xwedan mafê rûniştina demikî ne (Duldung) li gorî mada § 60 bendê 2 hevoka 3 ji yasaya rûniştinê (AufenthG) yan hun xwedan mafê rûniştinê (Aufenthaltserlaubnis) ne li gorî mada § 25 bendê 5 ji yasaya rûniştinê (AufenthG).

Têbinî: Heger we di dema pêşkêşkirina daxwaziya penaberiye de yan di dema îfadeya şexsî di çarçoveya doza penaberiye de belgeya erêkirina tevlîbûna di kursa întegrasyonê de standibe, wê demê pêwîst nake ku hun careke din daxwaznameyeke taybet ji bo vê mijarê pêşkêş bikin.

Zarrok, nûciwan û ciwanê ku hêj di temenê dibistanê de ne û dibe ku beşdarî dibistanê bibin, nikarin di kursa întegrasyonê de beşdarbibin.

Kursa întegrasyonê çi ye?

Kursa întegrasyonê ya giştî ji du beşan pêk tê: Kursa ziman û kursa rênemayî .

Di kursa ziman de hun dê fêrî gotin û nivîsîna wan peyvan bibin yên ku ji bo jiyana we ya rojane pêwîst in. Wek peyvên pêwîst ji bo têkiliyên we bi dam û dezgehên dewletê re û bi danûstandina bi gundî û cîranan re û bi cihê kar re û ji bo nivîsandina nameyan û tijekirina pirsnameyan.

Kursa rênemayî wê we di derheqê jiyana li Almaniya de agahdar bike û zaniyarian di derheqê rêbazên yasayî de yên komara Almaniya û herweha derbarê çand û dîroka nuh ya vî welatî deyne ber destên we.

Kursa întegrasyonê ya giştî ji kursa ziman bi 600 saetên dersê (her saetek 45 xûlekan dewa dike) û ji kursa rênemayî bi 100 saetên dersê pêk tê. Kursa ziman ji şeş beşan ku her beşek 100 saetên dersê ne pêk tê. 300 saetên dersê yên destpêkî kursê bingehîn tê binavkirin û 300 saetên dersê yên paşê wek kursa pêşketî tê binavkirin.

Hindek kursên integrasyonê yên taybet hene, wek mînak kursên ji bo jinan, ji bo dayik û bavan, ji bo ciwanan û herweha ji bo kesên, ku hîn baş nizanin bixwînin û binivîsin. Ev kurs ji 1.000 saetên dersê pêk tên.

Gava ku hun bixwazin pir zû fêrî ziman bibin, hun dikarin tevî kursekî xurt (Intensivkurs) bibin. Ev kurs ji 430 saetên dersê pêk tê.

Navenda ku kursa întegrasyonê pêk tîne, "rêvebirê kursê", di destpêka kursê de ezmûnekê ji we re çêdike, taku pileya zanebûna we bizanibe. Bi alîkariya vê ezmûnê dide xwiyani kirin, ka kîjan kurs û kîjan beşa kursê ji were li destpêkê kêrhatî ye. Ev ezmûna destpêkeyî belaş e .

Tevlêbûna di ezmûna dawî de

Ezmûna dawî ji ezmûna ziman û ji ezmûna rênemayî li dawiya kursê pêktê "Jiyan li Almaniyayê" tê binavkirin. Gava hun di ezmûna ziman tesbît bikin, ku hun pak bi zimanê almanî dizanin û hun di ezmûna rênemayî jî de "Jiyan li Almaniyayê" biserkevin, wê gavê hun kursa întegrasyonê bi serfirazî xelas dikin û hun dê bawernameya kursa întegrasyonê „Zertifikat Integrationskurs“ bistînin.

Gava hun di ezmûnekê ji van herdu ezmûnan de bisernekevin, hun dê belgeyekê werbigirin, ku tê de encama ezmûnan hatiye nivîsandin.

Tevlêbûna di ezmûna dawî de bê pere ye.

Qebûlbûn di kursa întegrasyonê de ji aliyê dezgeha federal ve û qeydkirina li cem rêvebirê kursê

Ji kerema xwe re daxwaznameya xwe ji bo qebûlbûnê bi tevahî û bi destxeteke zelal tije bikin. Eger navnîşana ku we qeyd kiriye bi navekî din ji bilî navê we ye, pêwîst e ku hun beşa "Niha li cem (c/o) dijîm" (bi almanî "Gegebenenfalls wohnhaft bei (c/o)") jî tije bikin, ji ber heger hun navnîşana xwe dursut nenivîsin, dibe ku post neghîje ber destê we. Ji kerema xwe re wan belgeyên ku di pirsnameyê de hatî binavkirin tevî pirsnameyê bike û li ser navnîşana ku hatî destnîşankirin bişîne.

Bi îmkazkirina daxwaznameya qebûlkerinê, hun qebûl dikin, ku dezgeha federal ji bo karûbarê koçberiyê û penaberan (Bundesamt für Migration und Flüchtlinge) daneyên we bo mebesta pêkanîna kursa întegrasyon kom bike, lêkolîn bike û bikarbîne û wan li gel daneyê berdest di dezgeha federal de bo pêkanîna pêvajoya penaberiyê kontrol bike. Ev pêngav ji bo wê yekê tê kirin, taku rê li ber wan kesan were girtin, ew kesên ku li welatekî din ji welatên Yekîtiya Europayê daxwaziya penaberiyê kirine yan ew kesên ku li gorî rêbaza Dublin III mecbûr in li welatekî din ji welatên Yekîtiya Europayê daxwaziya penaberiya xwe bidin.

Hun herwisa bi înzeya xwe qebûl dikin, ku eger gengaz be, danberhevek ligel daneyê kombûyî di tomara navendî ya biyaniyan de were kirin. Di vê çarçoveyê de tê kontrolkirin ka gelo izina rûniştina demikî (Duldung) li gorî mada 60a bendê 2 hevoka 3 ji yasaya rûniştinê (AufenthG) yan izina rûniştinê (Aufenthaltserlaubnis) li gorî mada 25 bendê 5 ji yasaya rûniştinê (AufenthG) li ber dest e.

Heger hun mafdarê tevlîbûna kursa întegrasyonê bin, wê demê hun dê nivîseke çesbandî (Belgeya mafê tevlîbûnê) ji dezgeha federal (BAMF) werbigrin ji bo tevlîbûna kursa întegrasyonê. Li gel wê nivîsê yan belgeyê wê lîsteyeke xwendegêhên nêzîkî mala we ji we re bişînin, ku kursên ziman pêşkêş dikin.

Têbinî: Heger we di dema pêşkêşkirina daxwaziya penaberiyê de yan di dema îfadeya şexsî de di çarçoveya doza penaberiyê de belgeya erêkirina tevlîbûna di kursa întegrasyonê de standibe, wê demê pêwîst nake ku hun careke din daxwaznameyêke taybet ji bo vê mijarê pêşkêş bikin.

Erêkirina tevlîbûna we di kursê de 3 heyvan misogir e. Di belgeya qebûlkirinê de hatiye nivîsandin heta kengî ev pejrandin ji bo we misogir e. Ji kerema xwe re navê xwe ji bo kursa întegrasyonê li cem wê xwendegêhê qeyd bikin, ya ku ji we re hatiye destnîşankirin û belgeya mafê tevlîbûnê (Berechtigungsschein) pêşberî wî cihî bikin. Heger navê wê xwendegêhê ji we re nehatibe destnîşankirin, ji kerema xwe re di zûtirîn dem de navê xwe li cem xwendegêheke bi dilê xwe qeyd bikin.

Taku tevlîbûna we di kursekê de di zûtirîn dem de misogir bibe, dezgeha federal (BAMF) dikare we bişîne xwendegêheke taybet ji bo kursa întegrasyonê.

Xwendegêha ku kurs pêşkêş dike, mecbûr e, ku ji we re bêje, ka kengî çaverê ye, ku kurs destpêbike. Divê kurs ne derengtir ji 6 heftiyên piştî derbasbûna qeydkirina we destpêbike. Heger di van her şeş heftiyên de kurs destpênekir, divê xwendegêha kurs we agahdar bike.

Ji kerema xwe re haydar bin, ku mafê we ji bo tevlîbûnê dişewite, heger hun ji ber sebêbên girêdayî bi şexsê we ve di navbera salekê de piştî qeydkirina di kursa întegrasyonê de dest bi kursê nekin yan jî heger hun bihtir ji salekê dev ji kursê berdin.

Tevlîbûna bi rêk û pêk di kursê de

Taku hun bigîhîjin armanca kursa întegrasyonê, divê hun bi rêk û pêk û li gorî rêbazan tevlî kursê bibin. Ev tê wê wateyê, ku hun bi rêk û pêk heta dawîya kursê tevlî dersan bibin û herweha tevlî ezmûna dawî jî bibin. Bi serûber berdewamkirina kursê bo vê yekê jî girîng e, ku piştî bikaribin hindêk beşên kursê dubare bikin heger hun bixwazin. Gava hun bixwazin, rêvebirê kursê dikare serdana we ya bi serûber bi rengekî nivîskî tesbît bike û belgeyêkê derbarê vê yekê radestî we bike.

Guhdana zarokan

Heger pêwîstiya we ji bo tevlîbûna kursê întegrasyonê bi guhdana zarokan hebe, hun dikarin bi berpîrsê kursê re biaxivin. Ewê we derbarê derfetên li ber dest ji bo guhdana zarokan agahdar bike.

Guhertina rêvebirê kursê

Bi giştî guherandina kursê yan xwendegêhê bi tenê piştî temamkirina beşekî kursê mumkin e. Guherandin bi tenê di hindêk rewşên taybet de mumkin e, bi taybet gava ku merov mala xwe biguhêze devereke din yan heger ji nivî dewamê bike dewama sax yan berûvajî vê yekê yan taku dayik û bav karibin hay ji zarokên xwe hebin yan jî taku merov karibe dest bi fêrbûna karekî bike

(Ausbildung) yan taku karibe dest bi karekî bike, û ev guhertin bi tenê piştî temamkirina beşekî kursê mumkin e.

Eger guhertin kursê ji ber sedemeke din were kirin, dersên wî beşê kurs ku hun tevî nebûne winda dibin.

Eger guhertin were qebûl kirin û pêk were, rêvebirê kursê gerek e belgeya mafê tevlibûna kursê li we vegeîne.

Mesrefa kursa întegrasyonê

Beşdarbûna di kursê de ji were belaş e.

Mesrefa hatûcûnê

Hun dikarin beşekî ji mesrefa hatinûcûna xwe ji dezgeha federal (BAMF) wek alîkarî werbigirin. Merca pêwîst ev e, ku cihê kursê bêhtirî ji 3 km ji mala we dûr be. Ev alîkarî wê ji bo her rojeke kursê were hesab kirin. Divê hun daxwaznameya alîkariyê ji wê wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF) re bişînin ya ku berpîrsa cihê rûniştina we ye. Hun dikarin navnîşana van wargehan li înternetê li ser malpera www.bamf.de peyda bikin. Peyva "Web-GIS" di malika "Lêgerînê" de binivîsîne û lê bigerin. Hêdî malpereke lêgerînê wê ji we re vebe. Navnîşana xwe li vir binivîsîne û bijareya "zuständige Regionalstelle mit Regionalkoordinator" hilbijêre; paşê li ser "Lêgerînê" bitikîne.

Dubarekirina heta bi 300 saetên kursa ziman

Hun dikarin li gorî hindek şert û mercên taybet yekcarê bi tenê 300 saetên dersê kursa ziman dubare bikin. Ji bo ku destûra dubarekirinê bidin we divê hun bi rêk û pêk û li gorî rêbazê tevî kursa ziman bûbin û hun tevî ezmûna ziman bûbin û hun di vê ezmûnê de bisernektibin (Asta ziman B1)

Taku hun karibin tevî dubarekirina kursê bibin divê hun daxwaznameyeke nivîskî arastey wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF) ya ku berpîrsê cihê rûniştina we ye bikin .

Ger ku hun tevî kurseke fêrkirina xwendin û nivîsandinê dibin, wê demê tevlibûna we ya pêşwext di ezmûna ziman de ne pêwîst e ji bo bidestxistina mafê dubarekirina 300 saetên din.

Tiştên din yên divê ku hun pê bizanibin

Hun dikarin hemu pirsname û daxwaznameyên ku di vê belavokê de hatine binav kirin ji birêvebirê kursê, ji wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF) ya ku berpîrsê cihê rûniştina we ye bistînin. Tevî vê yekê hun dikarin li navnîşana înternetê ya "www.bamf.de" jî bibînin.

Ji bilî vê yekê jî ji kerema xwe re haydarî xizmetguzariyên dezgehên şêwirmendiya koçberiyê û xizmetguzariya koçberiya ciwanan bin. Ev dezgeh dikarin alîkarîya we ji bo dagirtina pirsnameyan bikin û bersiva pîrsên we bidin û guh didin pîrsgirêken we û dikarin herweha ji bo we li kurseke herî baş bigerin. Hun dikarin navûnîşanên dezgehên şêwirmendiya koçberiyê û xizmetguzariyên koçberiya ciwanan yên li der û dora we ji dezgeha karûbarê biyaniyan (Ausländerbehörde) ya herêmî û ji wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF) yan jî ji navnîşana înternetê ya "www.bamf.de" werbigirin.

Di vê belavokê de agahdariyên herî girîng derbarê tevlîbûna kursa întegrasyonê hene.
Birêvebirê kursê dikare di derheqê naverokên din yê kursê de agahdariyan bide we.

Ji kerema xwe re hayadar be ku di dema tevlîbûna we ya kurseke entegrasyonê de sîgorta yan tamîna we ya yasayî ji bo qezayan nîn e.

Em hêvidar in ku hun di kursa întegrasyonê de biserbikevin!